# Fîlma Av û Hewayê > Peymanên Av û Hewayê

Di bin siya konvansiyona çarçoveya li bara guherîna av û hewayê ya Rêxistina Neteweyê Yekbûyî(NY) bo gihîştina lihevkirineka navneteweyî li ser av û hewayê bi qasî 20 salan muzakire û gotûbêj hebûne. Qaşo dabekirina barê kar hîn jî pirsa sereke ya nakokiyên gotûbêjan e. Her welatek gerek çi qasî çêkirina gazên gulxaneyî kêm bike û kî yê dirav bide? Em ê di vê fîlmê da rojek ji rojên çalakvanekî av û hewayê bi navê Lan Marî Ngûyên Bêrgbişopînin û li bara lihevkirinên av û hewayê, gotûbêjên ser av û hewayê, karên bo kêmkirina gazan û çawaniya têketina ciwanan di vê qadê da agahiyan hîn bibin.

Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Di 100 salên borî da, navgîna germahiya cîhanî çawan guheriye?
2. Di heman serdemê da asta giştî ya $CO_2$`ya cîhanê çawan guheriye?
3. Herî kêm navên pênc welatan bibêjin ku niha $CO_2$`yê zêde çêdikin?
4. Çima hûn fikir dikin ku gotûbêjkirina ser lihevkirinên baş ên navneteweyî li bara av û hewayê dijwar e?

## Erk û karên têkildarî fîlmê:

1. Li sala 1992`yan li bajarê Riyoyê, konvansiyona av û hewayê ya NY ji aliyê piraniya welatên endamên NY va hat wajo û îmzekirin. Piştre, li bajarê Kyotoyê, li Japonê, li sala 1997`an ser protokola Kyotoyê gotûbêj kirin. Naveroka sereke ya her duyên van peymanan di çend hevokan da binivîsin.
2. Çima evê ku Amerîkayê peymana Kyotoyê îmze nekir xaleka mezin a neyînî bû?
3. Ew welatên di geşepêdanê da ne û peymana Kyotoyê îmze kirine anegorî welatên dewlemend erkên diyarbûyê yên kêmtir ser milên wan in sa ku gazê kêmtir çêbikin. Hejmarek ji van welatên di geşepêdanê da ne, wekî Çîn û Hindistan, di van salên dawîn da pêşketina wan a aborî pirr bûye û gaza $CO_2$`yê jî zêde çêkirine. Çima hûn fikir dikin ku beşdarkirina van welatan di peymaneka teze ya ser av û hewayê da dijwar e?
4. Gellek welatên hejar asta lihevkirina wan a çêkirina gazaê kêm e, lê derbeyên mezin ji çêbûna gazê dixwin, daxwaza wan welatan ji civaka cîhanî çi ye?
5. Mînakekê ji biryareka siyasî bidin ku li Norvêjê hatiye dayîn û dikare çêbûna gazên gulxaneyî kêm bike.

6. Norvêjê erkên xwe di protokola Kyotoyê da çawan pêk aniye?
7. Encamên herî girîng ên civîna ser av û hewayê li bajarê Dohayê li sala 2012`an çi bûn?
8. Hin mînakan ji wan astengiyan bînin ku di dema gotûbêjan ser peymaneka teze ya av û hewayê li sala 2015`an da pêk hatin.
9. Bo vê hokarê ku dibêje ciwan gerek têkevin qada gotûbêjên ser av û hewayê hin sebeban bibêjin.
10. Pêşniyarên xwe li bara vê yekê amade bikin ku gerek çi were kirin sa ku germbûna cîhanê raweste.

## Erk û karên xurtbûyî:

1. Protokola Kyotoyê rê dide wan welatan ku dil hene çêkirina gazan qut bikin bi awayekî din vî karî bikin sa ku tenê kêmkirina van gazan li welatê wan nebe.Ev lihevkirin sa sê mekanîsman rê vedike ku ser kiryarên neteweyî zêde dibin û armanca wan ew e ku gihîştina vê armanca av û hewayê erzantir dike.Ev mekanîzm ev in, bazriganiya Para Çêkirina Gazan, Mekanîsma Geşepêdana PakCDM) û Pêkanîna Hevbeş(JI).
   a) Armanca van her sê mekanîsman şirove bikin.
   b) Li ser wan mekanîsman ku idia dikin li gorî ku gerek bibûna pêk nehatine, rexne hene. Li bara bingeha vê rexneyê mînakekê bidin.
2. Çima pesendkirina peymanên navneteweyî ser av û hewayê sa Amerîkayê dijwar e?
3. Gotinên li jêrê binirxînin û kurteyekê binivîsin ku berpirsyariyên Çîn û Norvêjê li bara çêkirina gazên gulxaneyî nîqaş dike.
   – “Norvêj berpirsa ji sedî yek deqeyê çêkirina hemî gaza cîhanê ye! Çîn nêzîkî du vejengehên komirê her hefteyê vedike,tenê yek ji wan ji hemî malbatên Norvêjê pirtir gazan çêdike.” (FPU)
   – “Norvêj li gorî her ferdî ji Çînê pirtir diravê gazên gulxaneyî dide!” (Grønn Ungdom)